Ji pirtûkxana Casimê Celîl 1

H. Tûmanyan

# Şe û Pişîk




Wien - 2012

Çapkîr — Înstîtûta kurdzanîyê - Wien (IKW)

**H. Tûmanyan: Se û pişîk**

Werger — *Casimê Celîl*
Lîtograf — *Danco*
Weşana pêşin — 1935 Rewan
Karê kompyûtêrê — *Lûsîka Gêrman*
Mîzanpaj — *Cemal Celîl (Alionis)*




ISBN 3 - 902185 - 22 - 8

Ji pirtûkxana Casimê Celîl 1

**H. Tûmanyan**

# Se û Pişîk

**Werger: Casimê Celîl**

**Wien - 2012**

# Se û pişîk

Wextekê pişîkek terzî bû,
Serê sê jî kum tunebû,
Hê nizanim ji kîderê,
Dest xistibû postekî berxê,
Û rojeke zivistanê,
Bir cem pişîkê, postê berxê,
— Roja te bi xêr hoste pişo,
Serê min serma kir, bo Xwedê be,
Hanê evî postî û ji mira,
Kumekî bidrû serê mira.
Bona pere tu arxayîn be,



Hema, hema zef dereng nebe.
— Ser çevê min xalê kûçik,
Kûmeke, xwe kurkek nîne?
Bona xatrê teyî delal,
Roja înîyê were bive.
Bona pere çi layîqe,
Xeverdan jî nav meda şerme,
Çi tiştekî mezine, lo mal ava,
Her tenê heqê kumekî.
Înîyê, xalê kûçik
Pêşîya hostê xwe dihejîne,







Girmîna wîye giran û mezin,
Ser şêmîka hoste sekinîye:
— Kanê hoste? Kanê papaxê min?
— Hinekî bisekine wê niha bê.
Hoste wê hat kurkî lêye,
Se dît, bin simêlê xwe,
Hinekî xwe bi xwe kire mirtemirt.
Û ser mişterî kire qareqar:
— Surê tu birî, ay malava?
Nahêlî ku bînê bikşînim

Tiştekî hêsa xu nîne, hela teze,
Min şil kirye, ku ez bidrûm.
—De mal ava, usa bêje,
Ew xeyîda te diha çîye?
Min pere daye ku zû bidrûy,
Yan na, bêje sibê were,
Him dibêjî, him jî nadrûî,
Him xeber didî, ser min diqîrî,
Him, him, him, him,
Bira çiqasî herim û bêm?



Kûçkê bi xeyd usa got,
Vegerîya serî bi qot.
Carekê jî hat, dîsa tunebû,
Vê carê li hev ketin,
Diha bê hurmetî, gilîyê xirab,
Diha kevn û teze, dê û bav.
Diha pişîka diz û kûçkê keçel,
Gilîyê wan gihîşt destê dîwanbaşî.
Kûçik hetanî çû û hat,
Pişîka hoste dil şkestî bû,
Serê xwe hilda û şevekê,



Here ku herî, ew undabû…
Ji wê rojê heta îro jî,
Kûçik ev yek bîr nekirîye,
Bîra xweda hela hê xwey dike,
Kêderê ku pişîkê dibîne,
Banzdide û serda digre,
Postê xwe jê pajda dixaze.
Lê pişîka rûreş nişkêva
Pajda vedigere û bi hêrs
Dike piştîn, yanê min teze
Av reşandîye, kû bidrûm.

